

Navdarên cîhanê

Leonardo Davînsî

1452 - 1519

Vekoler û zanayên bispor di bîzavê jîriya mirovan da dibêjin: "Leonardo Davînsî jîrtirîn û behredartirîn mirov e, heta evro, li ser rûyê erdî jîyayî."


Tiştê ku Leonardo Davînsî ji behredarên dî yên mîna.. Enştayn, Nîwtin, Galîlê, Bêhtovin û gelekên dî cuda dike ewe ku, ev mirovên navberî bi tenê di bîyavekê da di şehreza bûn û dahênan kirîye, lê Leonardo her tiştek zaniye û di hemu bîyavan jî da dahênan kirîye, bigre ji nîgarkêşî û endazîlistikya nîjnînê heta enatomîya leşê mirovî.

Leonardo li sala (1452) zayînî li gundê (vinşî) li nêzikî bajêrê (florensa) ji dayik buye. Babê wî parêzerekê navdar bû û dayka wî kiça cotyarekî bû.

Pênc salên pêşiyê ji temenê xwe li gundi jîyaye, paşî dayka wî şû kir û ew hinarte dev babê wî li bajêrê (florensa). Hêsta gelek zû, jîrî û behremendîya Leonardo di bîyavê nîgarkêşî û peykersazîyê da dîyar bû ji ber hindê babê wî dana ber destê mamostayekê şehreza. Leonardo di bîst salîya xwe da bû êk ji navdartirîn hunermendên serdemê xwe.

Di heman dem da, Leonardo behreyeka mezin di warê endazîlistikyê jî da nişa da û bi taybetî di pilankêşan a pir û avrêj û bingehêن leşkerî yêن asê da.

Leşê mirovî ji çi pêk dihêt û çewa kar dike(şelelê) destê wî yê rastê girt û êdî neşîya kar biket û li û rûvik çewa şîn dîbin eve jî cihê pepêdana bûn û nihêniyêن mezin di van waran da aşkra kirîne.



Leonardo li wî serdemî pêşbinî kirîye ku rojekê mirov dê şen amîrîn wesa dahênin ku pê bifirine ber esmanan û li bin ê deryayan bigerin.

(Munâlîza) û (şîva dawîyê) du navdartirîn kevalin di dîroka hunerê şêwekarîyê da ku ji layê wî ve hatine kêşan û her sal bi milyonan kes diçine mozexaneyê ji bo dena wan.

Li dumahîya temenê Leonardo da, damlê sala (1519) î çû ber dilovanîya Xwedê.

Di hemu dîroka mirovatîyê da, kesek nîne hindî Davînsî dahênan kiribe. Di ser hindî ra jî li ber mirina xwe got: "Kovana min ya mezin ewe: temenê min bi dumahî hat û min çi nekir!"